Şeva Pêxas

Hesen Şucaî

Şeva pêxas leşê gelî û newala vedişart
û pirpiroka sipî gêj li qêrîna reş
di nav çiyayên roj ava
bi dengê sor dikir gazî,
‘’neçe avê!’’
neçe avê
şeve baranek bêsitar
li jor da tê
keça bêmal
bibe xudan
neşkêne ba
cêrê ser milê te
biparêze
nerevîne xew çavên te
çima ku vegera sibê
vebe deryê zîndana min
tenê bi çavê te rênasim.